P.D.K.S
الحزب الديمقراطي الكردي في سوريا
1957

# DENGÊ KURD

10 pûşper 2713 k 1-7-2013 z DENGê KURD -hjmar (11) www. Pdksp.com

# Milmilana siyasî li rojavayê kurdistanê serî dikşîne




## Destgîrkirin

Mirov serbest û azad tête jiyanê. Paşî ji dayikbûnê, wa diyara ku ji daikbûn peyama raghandina azadîyê ji wî tak mirovî re. Mirov roha di bê ji hemi şengist û têkelîyên dugiyanîde majidayik bûnê, dêmekî ji dayikbûn pişkûrina jiyana azadîyê .Li di jiyana tevgera rizgarîxwazde pirsgirêk û kêşedozên peywendîdar tevliv û pivbendin, dêmekî cepokaşî û dijwarî û astengîzor û belavin .Destgîkirin Mirov xwedî pîr û poçon karekî krêt nerewaya ji ber ko mirov mafê xwe heye di derbirîna bîr û boçon û helwêstin cawaz û servedar. Li ev rojên dawî de komerîşkên yên grêday bi pydve destdrêjîkirin li ser hevalên partî û ew destgîrkirin hate pêkanaîn ji ber cidabûna bîrboçona rêbaza siyasî, dêmekî ev krêtka rîama je bi du rehend metirsî de, yekem :endebûriya siyasî li cem evî alîgirê gomanlêkirî çimkî rêncbirayetî dike ji rêjîmê re, ya duwem şêwandina rweşa siyasî û pêşêlkirina hemû rêkeftinên siyasî û nerîtên kurdewarî, û li domahîkê destgîrkirn dibe rewşenbîriyeke keleporî, em hemû li beramberî wê berpirsiyarin.

**Dengê kurd**

## Di Bîranîna Partî de Silav û Rêz

Rewşa suriyê û ..nêrînek cuda(1)

2

Bizava rizgarkirina kurdistanê

3

Cêwaziya Jina Kurd li vê qonaxê

3

www.arsivakurd.org

# Milmilana siyasî li rojavayê kurdistanê serî dikşîne

**Dengê kurd**

Milmlana siyasî li rojavayê kurdistan du sedemên serkî xwey hene û sê rehendên peywendîdar bi awan herdû sedeme hene li ser astê berjewndên nêzîk û dûr . Sedemê yekem yê serkî ji milmlanêde ne sînorkirna helwêstê kurdî ji şoreşa sûrî yê , ji ber ko ta nûka tevgera rizgarîxwaz codabûnxwaza di nerîne xweda bi bal evê şoreşê ve , weko tê zanîn dû encûmenên kurdî hene, li alîkî encûmena gelê rojava ya pyd têkelîxwe bi rêjêmê ve û di gel dijminya dejberî ya navxoyî ya hevrêzên niştîmanî û li alîkî dîtir ve encûmne kurdî ya niştîmanî ko hemû part û şepêlên kurd hembêz dike ko ew jî qaşo dijî rijêmê ve ye , lê mixabin ne rêkeftiya ta nûka di gel dijberiya sûriya ve ya ji derve û ya ko palpiştkiriya ji bal komsara erebî ve û dewletên herîmî û navnetewî . Sedemê duwem ji milmlanê re hebûne du rêbazên siyas dubendîxwaz di tevgerê de du projeên cewaz di semt û armancê de, dêmekî encûmana pyd proja yê fantazwazî yê nwênerdike yê ko hatiya bingehkirin ê selmandin li ser diroşmên mijbîn û brîqedar wek dîmoqratiya gilerî û kargêrana xomalî. Û li rexkî dîtir ve projeyê fidralîzmê yê ko partî hilgrtiya û daya li ser şan û milê xwe weko mafekî reaxaz û rewagîr di biramber xwaziya siyasî de ci li astê netewî ci li astê niştêmanî , weko projekê bragmatî cavnêrkirî û çargerkirî di daxwazî û çespandnê de. Liew herdû sedem sê rehindên peywendîdar ji wan du rêz û hevrêzdibin ew jî evin Yekem - kurd bêpardibin ji svra rûxandina rijêmê ve deme ko dimênin ta nûka bê ti levkirin û sitratîcîyeka siyasî da ko têkeve warê careserîke bala netewî û pêk anaîna berjewendên cavnêrkirî ji mêjde. duwem - alozî nakokî zor û pirdibin di nava alîgrên dijberî de ci li astî navxo yî



de ci li astê niştîmanî de bi gelem perî û wisa rewiş û bardox serîdikşîne bi ber û pirsgrêkin komerşkî û pîlangîrîn. sêyem- hemû mafkêşanên dîrokî û cografî têkdiçin deme ko ew pirsgirêk carsernebin di navbera tevgera kurdî de ji alîkî ve û ji alîkî dîtir ve di navbera kurd û alîgirên dijberiya erebi de. Milmlana siyasî di qerana nakokiya nde ji ber ko siyasetvanan hemû rê û xaçrêk li pêşîya xwe girtina , ew siyasetvananko berjewndîyên partêxwazî û kesokî bîraweriya wan korkiriya gohştiya astê ko sewdan hedikarê biponje di çare û rêçarayan de , milmlan serdikşînê hevkatî bi ser kêşxwaziya siysetvanan re.

# Di Bîranîna Partî de Silav û Rêz

**Helîm Xelo**

Xûşik û birayên xwşewîst , beşdarên berêz di salvegera damezrandina partî de , bi navêxwe û navê malbat û êla xwe û hemî kesayetiyên ko tevlî xebata kurdayetî bûne paşî damezrandina partiya kurdya yekemîn li sûriyayê sala 1957 ez pîrozbahiya sal vegera 56 mîn ya damezrandnê dikim û silav û rêzê digrim li hemî xebatkarên ko di wê demê de bingeha xebata netewiya kurdî danîn, yên ko çûne ser dilovaniya xwedê û yên hîna li jiyanê ne , û di heman demê de silav û rêz ji bo hemî têkoşerên di vê xebatê dişopînin û ez behwerdikim ko di demek nêzîk de wêmiletê kurd berhemên wê xebata zehmet ya dûr û drêjbiçine û wê mafên xwey netewî bi destxîne çimkî ez di nerîna xwede me ko şoreşa îro li sûriyayê berdewame wê derîveke komiletê kurd bighêje hemî mafênxweyên netewîyên ko jêbê parmaye bi drêjahiya dihên salan ji sedema siyaseta regezperstî û şovînîyê desthelat û rijêmênsûriyayê û bi taybetî rijêma bas yako li sermiletê kurd hatiya pêkanîn .Gelîxûşk û birayan bi helkefta salvegera 56 min ya parta yekemîne zbangewazîdikim tevgera netewî ya li sûriyayê koyekrêziyaxwe bi parêzin di vêqunaxahestyar û dîrokîde ji ber ko yekrêzî ew mercê serkeftna me tevane û serkeftina doza netewiya kurd bi giştî , di heman demê de ez sipasiya cenabê serok Mesûd Barzanî dikim ko rewşa rojavayê kurdistanê dişopîne û hewldanê dike ko yekrêziya tevgera netewî li sûriyayê pêkbîne û bi parêze ji hemî metrsiyan û ew jî nîşana hestê netewiyê Berz ji hêla Serok Barzanî ve, ewê dîrok ji Serok Barzanî vî rolê netewî binvîsî ne, û wê ji rêbaza Barzanîre vê xebataê û têkoşînê biçespîne çimkî vê rêbazaê herdem xwe tekûz kiriye ko rêbaza kurdayetiyê ye . Di dumahîkê de ez Sipasiya Partiya demokrata kurd li sûriyayê dikim û hêviya Serkeftinê jêre di xwazim û ez bi behwerim ev partî wê di asta hêviya miletê kurd dibe.

# Rewşa suriyê û ..nêrînek cuda(1)

**Kirmancê çalî**

Di destpêka serhildana şoreşa surîyê de ,gelek kesan şreoveyên syasî u civakî didan peyîhev u cîhan di kireşama şerif, lê şam bûye qada şerê dû nêrînê nolîyên dij bi mirovatî u îslamê .Di alîyê herêmî de serkêşîya şîieyan bi hevsargirtina îranê u melayên wêye, di alîyê sunneyan da qeter u hindek welatên dîtir yên erebî qada dijberîyên olîyên xwe gerimkirine .Niha meseleya rewşa surîyê di gengeşeyên dijhev da derbaz di be, alozî u xetera mezin




li bê bawerbûna welatên hêzdarên cîhanê ye ku şoreş bi şoreşeke tundrê u girtî u radîkalî di bînin.Lê girng rewşa kurdistanê ye ka xelkê me yê rojava çawa şoreşê di bînin?Wekeeztê gihştî mde stpêka vê şoreşê tolhildanên gelek kesê tî u welatê nkuzirar li destê surîyê dîtine bi rêve di çe ,nek şoreşe kexweser a civaka surî ye. Renge hindek kes we habi bînink u ezbêba werim bi serkirde yên şoreşê an jî bi wan tevger u partîyên ku şoreşaçekdarî li darxistine ,lê berovajî ez di wê bwerê deme ku şoreşa surî ji derveyê îradeya civaka surîyê gerim bû ye , syasîyên ereb jî ku di nava şoreşê de xebatê di kin bi eql u hêzamîka nîkîyabe rjewen dîxwazan di zivrin. Lê partîyên kurd bi dur û yîy axweyad ij hev a li ser mêzên danustan u rêkkeftinan u qada xebata nav bajaran ,dêgelê me jivêqûnaxa tejîa stengderbas kin.Ez di tirsim ku ev jana erebî bi keve di nav civaka kurdî de u bi bîtejana dwemîna li pêşa ponîzmê de .

# Bizava rizgarkirina kurdistanî û serkêşiya vê qûnaxê

**Simko Emerê Leelê:**



Bêguman dema mirov rûpelê dîroka kurdistanê vekê pel bi pel mirovê gelek astenga bi bîn êlê be lê mirov wê beramberî astenga serkeftina jî bi bînêyek ji wa serkeftina avakirina ykemîn partî ji bo rizgarkirina xak û miletê kurdistanê ji dagîrkerê kurdistanê li gor nerînê minî taybet serkeftinek bû beri (56) ji bizava rizgarkirina kurdistanî re lê mixabin gelek asteng ketin pêşiya wê bizavê.

1-rijêmên desthilatyên dagîrkerê xaka kurdistaê.

2-parçebûna bizava kurdî. Eger mirov were li ser va herdo xala rawestê û şirove bike gelek rûpel wê werin miştkirin lê emê bikurtî li ser va herdo xala rawestin. Xala yekê: Rijêma desthilat bi xurtî dijî bizava kurdî rawesta û karî demek dirêj kar û xebata bizava kurdî sist bike û gelek cara rawestîne û êşên wê hatin xweya kirin li ser bizava rizgarkirina kurdistanî, a- parçbûn .b- balavkirina hiş û ramanê kurdî .c- nakokîya hatî çandin di nav bizava kurdî bi xwe bi xwede. Di nerînê min de rijêmê serkeftin anî. Xala didûyê parçebûna bizava kurdî li ber çavê me hemiya tê xweyakirin bi çirengî û bi çawayî nakokîyên fikrî di nav bizava kurdîde. Lê ez di karim bêjim serkêşiya vê qûnaxê ji serkêşên partiya tê xwestin û wa nakokîyên kû dijmin di nav wan de çandîn rakin ji bo karibin serkêşiya vê qûnaxa hestyar bikin û bibin cihê baweriyê li cem miletê xwe ji berkû baweriya miletê wa hatiye şikandin. Ji ber wê jî bihtirî kesên rewşenbîr û welatparêz dûri xebatê ketine.û ji serkeşê partiya tê xwestin kar û xebata xwe xurt bikin û xwe bikin cihê baweriyê li cem miletê xwe. û li dergehê rewşenbîr û welatparêzê xwe bidin û wan vegerînin li serkar û xebata wa ji ber kû mile kurd ji hemi dema bihtir li hêviya kar û xebata waye di vê qûnaxê de.

# Ma Heya Kengî Emê Bindest û Kole Bin?




**Mistefa Minle**




Jiberê û pêş de gava jiyan li sergokazemîn hatiye şênkirin ,rêdan û vacên li ser gerdûnê peydabûne, ji dema [ADEM Û HEWA]de xuya ye nakokî û gelaşî di navbera du hêzan de heye û herdu timtersîhevin û her we hajiyan berdewame,yek ji wan gewreye, ya dîjî reşe ,yan jî xêr û şer, paqi jî û gemarî..h.w.d. Lomajî tikesnikar evanna ko kiyên heyinî ji civakê rake, ev gelaş di jiyana merov û gelande berdewam in .Vêcawek em kurd dive em kari bin evnîr û demê ndijwar û cetin derbas bikin, û bi dil paqi jî û bi rengekî gêlaşo kemnerin ber babetan, û bi pelawela yîtikesna çeserî, heger çiproje bû yejêrehûr nêrîn û siknandin pêwîs tebê bawername û tozik serkeftinnîne, bi taybetî di ware siyaset û çalakiyên xebata tevgera kurdî de, pêdviye em îro jhajîdeke bazî û pêlanên dijminan hebin, dive em tiştêbaş û nebaş di navberahêz û partiyên welat parêz de ji hêlekê û yên xuniz û nokerji hêladîvejihev du cuda bikin ,ku îro jhinkeshene di navlep û tiliyên rêjîmê û dijmindebûne destik,ewjî diroj hilatana vîn de xizmetade wletên herêmê dikin. Lewre divî warî de gelême yê kurd di roj avayê kurdistanê de îro jneynik û wêneya me ye, di riya wan reem dikarin li xwevegerinkar û xebata xw ebinirxînin, divêem wan partiyên kudi xizmetane tewa gelê kurd de dixebitin û yên di bin bandoraka rbide stên dijmin de dilivin nasbikin,ji me tê xwestine mxwe jibîr nekin kuçawa di de mekê de li kurdistana başûr cahşhebûn bi rêjîmê re bûm, li dijî kurdan û li hember barzaniyan şer dikirin. Îro jdivê em enîsînaryo dûrne bînin, ev tişt û siyaset li ro java yê kurdistanê têajotin û meşandin, û ew jî berjiwendiyên dijmin û rêjîmêcih be cihdikin, lewre dûrî kurda ye tiyê dilivin, wek nimûne heger kurmêdêrnejidêr be darnakeve. Gelo ma demjivêçêtir û baştirji me kurdan re di roj avayê kurdistanê de dêlê were, dive evder fet û keysa kuketiye me emji nav lepênxweber nedinji bower girtinama fênMeyênetewî. Lewre pêdiviyeem kurd û partiyên me yên xwedî hest û xêr xwazem bi gîyanekî hestyar û berpirsiyar li ser rawestin, û vî barîhildin ser milên xwe, ji berkuerk û ustubarê me hemiya nekue mçareyekêjinetewa çarmelyon kurdre b ibînin, kuheyan u hajihemû xwestekên jiyanê bêpar mane. Jiber vê yekê pişt giriyah u kometaherêma kurdistanê û bi taybetî berêz [serok barzanî] bendewarî û dorkêşbûna wî li ba gelê me cihêrêz û hurmetêye, dive em li ber ronahiya rêbaza barzani yê nemir em rê û şivî lê nxwebişopînin û ev mûm û çira li başûr vê ketîemh em bêzbikin, vêca dive carekedîjî em der basîti kort û çewtiya nebin,biser birakujiyê de neçin, jidîrokê divêt em sûd kar bin, û care kî dîem kurd li çarşî û bazaranmînae ya rênroviyan netên firotan..

# Cêwaziya Jina Kurd



**EvînŞikakî**

Eger em werin pîvaneke di nabera jina kurd û jinên netewên dî, nemaze ew netewên derdora wê, emê bibînin ko rola wê her wisa azadiya wê, di civaka wê de û di malbata wê, pitire ji wan netewên dî. Tê zanîn ko jina kurd di dîwan û mecilisên axivtinê û danûstandinê de amadebû, nerîn û pişnyarên xwe di gotin, her wisa weke şêwermendekî li kêleka mêrê xwe disekinî, ew nerînên xwe bi şêweyeke azad diyardikir û derbirand, wekî nimone: Edla xan jina Osman paşa caf, ew jina ko gelek caran cihê mêrê xwe digirt û biryar distandin. Her weha Adla xan di dîwanên helbest xwendinê de dirunişt û giftogo dikir. Lê jin di wan civatên netewên dî tenê karê wan di zevî û bexce û di navmalê de bû. Ewê jinê qet ne dikarîbû di mecilis û dîwana mêra de rûne û biaxive, ew jin wekî xulamekî bû xizmeta wan meclisa dikir. Di civaka kurdî de ev tişt cîyawaz bû û derfeta azadiyê pitir bû û baştir bû. Her weha ev pencera azadiyê roj bi roj firehtir die.





# Ahengek Mûzîkjenîn Li Girkê Lekê Hate Gêran



Li hola mem û zîn li girkê lekê ahengek mûzîkjenîn hate gêran bi beşdarbûna evan her sê komên hunerî (koma serhed – koma zêwa – koma ciwana) ev ahenga hunerî hate li darxistin bi helkefta (56)mîn bi damezrandina partî û li gel amadebûna cemawerekî zor guhdêr û hunerxwaz û wisa aheng geşbû bi pêşkêşkirina çendîn awaz û sitranên kurdewar wek (nêrgiz - narê- rewşê - ezxelefim - ezkevokim - gulnîşan) di gel çend sitranên biyanî, û li paşre koma (zêwa) şanogeriyeke netewperwer pêşkêşkir li jêr nav û nîşanê (xwîna milet).



# Tenazî ....Qirpal û meyir

**can bapîr**

Bi qirpal û meyira sar tu nabî axa, ev penda ko hîna kes nizanî ev çend sed salin di sere bûriyane, wateya vê jî ko bi ked û azarkêşanê mirov nav ji bo xwe ava dike, ev (56) sal bûriyane di ser damezrandina yekem partî li rojavayê kurdistanê wekî kavkilîlkan li ser xaka berojê, de here lolo de lolo, hîna tu xwe dibînî di vê şêlûbêla rojavaê de. Sikritêr: sikritêrekî pênc sitêrk û nexasma tu berxekî windayî ye ji kerîkî mezin, de here lolo de here lolo, mafê te kurke , çima tu qirpal dixwazî , keko: qerpal te ne ji sermyê û ne ji germayê di parêzî , keko: mafê te keda te ye, meyira xwe bi xwe li ser bayêhênik.

# Roja Jinebiyên Cîhanê

Roja (23) yê cehzeranê roja giringîpêdanê ye bi jinebiyên cîhanê, komeleya giştî ya neteweyên hevgirtî biryar da bi taybetkarî li ser vî mijarî, û wisa sala 2011 mukirhatin bû bi giringîpêdanê, da ko kar û kirdûkoşên çalakiyan bêtin şopandin bi birêvekirin di ware giringîpêdanê de, da ko jinebî neyên bê parkirin ji mafên xwey miroxwazî û hevserîtî û yasagerî, û nexasma pêmayê aqaran û samanê bazirganî û bêparbûn ji zarokên xwe, û wisa bête parastin ji hemû azarkêşan û sitemkariyan, da ko jiyaneke pejirandî û rêzgirtî bi buhêre paşî ji destdana hevser û hevbeşê jiyana xwe, û wisa da ko ji rewşa xizanî û destdirêjî û kêmûkasiyan qurtalbibe û bibitin xwedana rêzlênanê.



# pîrozbahî

**Berêz Dr. Abdulhakim Bashar**
**Sekretera Giştî Partîya Demokratîya Kurdî li Surîyê**
**Berêz Dr. Abdulhakim Bashar**
**Rêveber û endamên Partiya Demokrata Kurd li Suryê - Al Parti**
**Silav û Rêz!**

Binavê xwe û bi navê PDK-Bakure ji-dil salvegera 56 min saliya dameziran-dina Partiya Demokrata Kurd li Suryê-Al Parti we pirozdikim. Hêvîdarim ku xebat û têkoşîna partiya we di demek nêzîk de bigehe armancên xwe, bo azadî û mafên gelê KurdistanaRojava. Partiye hewe heta îro tekoşînek mezin daye û didomîne. Bêguman siyaseta we kugor atifaqa Hewlêrê bi piştgirtin û tewcihatên cenabê serokê Herêma Kurdistanê Mesud Barzanirê li ber diyalogê û aştiyanavxweyîvedike û ev yeke baştirîn wesîleye ji bo care serkirina doza gelê Kurd û ji bo bidestxistina mafên wî. Serkeftin ji bo xebata we û azadî ji bo gelê me yê qehreman li Kurdistana Rojava û Suryê

**Birayê te S. BUCAK.**
**Dîyarbekîr, 14.06.2013**



# Ferhengok:dengê kurd

| | | | |
|---|---|---|---|
| **Giringîpêdan** | احتفاء - اهتمام | | |
| **Hevgirtî:** | متحد | **şengist:** | علاقة |
| **Taybetkarî:** | خصوصا | **dêmekî:** | لذلك فأن |
| **Mijar:** | موضوع | **pişkûrîn:** | افتتاح |
| **Mukurhatin:** | اعتراف | **pevbend:** | متعلق |
| **Kirdûkoş:** | مسعى - سعي | **çepokaşî:** | صعوبة |
| **Bêpar:** | محروم | **bîrûboçon:** | وجهة نظر- رأي |
| **Mirovxwazî:** | حق انساني | **servedar:** | مميز - ممتاز |
| **Hevser:** | زوج | **nerît:** | تقليد اجتماعي |
| **Hevserîtî:** | زواج | **dûmahîk:** | خاتمة- نهاية |
| **Yasagerî :** | حق قانوني | **kelepor:** | تراث |
| **Bazirganî:** | تجاري | **milmilan:** | نزاع |
| **Aqar:** | ارض مستثمرة | **sedem:** | سبب |
| **Saman:** | ملك- املاك | **rehend:** | بعد سياسي |
| **Sitemkarî:** | ظلم- مظلمة | **komsar:** | مجموعة دول )جامعة سياسية( |
| **Pejirandî:** | مقبول | **çavnêrkirî:** | منتظر |
| **Jidestdan:** | فقدان | **çareber:** | ممكن |
| **Hevbeş:** | شريك | **çareberkirî:** | ممكن التحقيق |
| **Xizanî:** | فقر | **mafkêşan:** | استحقاق |
| **Kêmûkasî:** | غمط الحق- نقص | **rêçare:** | خيار سياسي |
| **Rêzlênan:** | احترام، تقدير | **hevkatî:** | تزامنا - متزامنا |
| **destgîrkirin:** | اعتقال | | |

www.arsivakurdi.org